Nasjonalt senter for flerkulturell opplæring

ZARROK DI MALBATÊ ÇEND ZIMANÎTÎ YÊ DA

BELGEYA AGAHÎYAN

Kurmanji

PÊÐEKÎ

Ev belavoka agahîyan liser 10 pirsên kû dêbavê bipirranî liser mezinbûna zarrokên çend zimanî dipirsin, pêÐkêÐ dike. Herwisa ev belavoke bo karmendên baxçeyê zarrokan, dibistanan û navendên saxlemîyê hatîye berhev kirin û dikarin wek xaleka destpêkî bo hevpeyivîna gel dêbava liser mezinbûna zarrokên çend zimanî, bikar bînin.
Ev belgeya agahîyan liser esasa belavoka Swêdî ya Du ziman yan zêdetir – Hinek pêÐnîyar ji bo malbatên çend zimanî, li alîyê Rêxistina Lêkolîna Zimanasîyê di Rinkeby da hatîye dabîn kirin (http://modersmal.skolverket.se/) û rûnivîsek venêrîn kirî ye. Liser ev belavoke dubare karî hatîye kirin û gel rewÐa zarrokên çend zimanî li baxçeyê zarrokan û dibistanên Norwecê hatîye guncîn kirin.

ABOUT MULTILINGUALISM

Gelek welatên gerdonî, çend zimanî ne. axaftina bi zimanên cûda hêjayîyek giringe hem bo Ðexsan û hem jî bo civakê. Ziman tçkilîyek nêzîk heye gel kesayetî, civakî bûn û xwenîÐandana çandî û di encam da beÐek mezin li jîyana zarrok û mezinsala ne.

Çend zimanîtî yê gele qazancên erênî hene, û gelek malbatê kû du yan çend zimanê wan hene, nikarin jîyana bê ev qazancane fehm biken. Eger li baxçeyê zarrokan û dibistanan nêrînek erênî liser çend zimanîtîyê hebe, mezinbûna çend zimanîtîya zarroka tê bihêz bibe.

Malbatên çend zimanîtî taybetin.
Gengaze malbat bi Ðêweyên cûda du yan çend zimanî bin.

- Zimanê zikmakî yê yek ji dêbavan Norwecî nebît.
- Dêbava zimanên zikmakî yê cûda hebin û zarrok li destpêkê di malê da du yan çend zimanê cûda bibihîzît.
- Yek yan herdu ji dêbava li welatekê mezin bûne ku livir di mal û dibistanê bi zimanên cûda diaxivin.

Xênjî dêbavan, gelek malbatan hinek eqrebe hene ku rolek çalak li jîyana rojane ya zarrokan da dilîzin û dibine sedema berdestbûna çend zimana ji zarrokan re.

1 ZARROKEK DIKARE ÇEND ZIMANAN BIHERE HÎN BIBE?

Zarroke dikarin çend zimanan bihere hîn bibin. Di beÐek mezin li gerdonê, hîn bûna zimanên cûda ji temenê kêm bo zarrokan asa ye. Ji bo ku zarrok zimanên cûda heta asteke kêrhatî hîn bibe, mal, baxçeyê zarrokan û dibistan dibe bi rewÐek çalak alîkarî biken. BalkeÐe ku derdora zarrok çend zimanîtîya zarrokan biecibîne û destekê bidê.

Malbatên ku pêÐîneyek kêmnetewî hene, eger zimanê xwe yê zikmakî biparêzin, dikarin bi hêsanî gel malbat yan hevalên xwe di welatên dî da pêwendîyê bigirin. Zarrok di ev malbata ne da, eger liser zimanê zikmakî yê dêbavê xwe Ðarezayî hebin, derfeta beÐdarîya zêdetir liser mîrata çandî ya dêbavê xwe tê hebin. Ev yeke dibe sedema bihêzbûna kesayetî û hesta eleqedar bûna zarroakan.

2 GELO ZARROK EGER DÊBAV DI MALÊ DA BI ZIMANÊ ZIKMAKÎ YÊ XWE BIAXIVIN, HINÎ ZIMANÊ NORWECÎ DIBIN?

Zarrok, eger zimaneke zikmakî yê pêÐkevtî hebe, mercên baÐtir bo hînbûna zimanê duyem heye. Zimanê zikmakî û zimanê duyem dikarin wek piÐtîvan bo hevdu bixebitin. Eger zarrok têgehek di zimanê zikmakî da hîn bibe, wek mînak “gaajaysan” di Somalî da, hînbûna peyva hevwateya vê têgehê “sulten” di Norwecî da hêsantir dibe.

GiÐ dêbav dixwazin zarrokê wan li dibistanê serkevtî bin. Li ber wê gelek dêbav dixwazin ku zarrokên wan zimanê Norwecî bilez hîn bibin. Lê nabe ev bibe sedema bikar neanîna zimankê zikmakî ji alîyê dêbava di amweya axaftina gel zarrok. Dêbav dikarin ev rewÐê ji zarrokan re dabîn biken ku zarrok bikarin gel zimanê Norwecî hember bin. Ev yeke bi taybet di baxçeyê zarrokan û di derdorê heremî yan di hevrêyîya gel hevalan û xizmên dêbava diqewime.

3 EGER DÊBAV XWEDÎYÊ ZIMANÊ ZIKMAKÎ YÊ CÛDA NE DIBE BI ÇI ZIMANEKÊ GEL ZARROKÎ BIAXIVIN?

Di malbatên ku zimanê zikmakî yê dêbava cûda ye, tê pêƉnîyar kirin ku herdu dê û bav bi zimanê xwe yê zikmakî gel zarokê biaxivin. Dema ku giƉ malbat cem hevin, Ɖexs dikare her zimanê kû hest dike sirûƉtîye, yek ji zimanê zikmakî, zimanê Norwecî, yan zimanek dî yê hevbeƉ, bikar bîne. TiƉta balkeƉ eve ku dêbav bikarin bi zimanê ku baƉtir tê digehin gel zarrokk pêwendîyê bigirin. Herwisa di malbatên kû yek ji dêbava bi zimanê Norwecî diaxive û yên dî zimanek zikmakî yê cûda heye, bo zarok baƉtire ku her yek ji dêbava bi zimanê xwe biaxivin. Zimanê Norwecî bi giƉtî di malbatê wisa da zimanê pirranî ye ku tê bikar anîn. Eger dêbav dixwazin zarrokê wan çend zimanî bin, balkeƉe ku ji zarrok re alîkarîyê pêwîst bo hîn bûna herdu zimanan bê dayîn.

4 EGER ZIMAN ZARROK TEVHEV BE ÇAWA?

Ev bi giƉtî asa ye ku zarrokê çend zimanî peyivan di zimanê cûda da di hevokekê da biakr bîne. Ev mijare dikare bi sedema ev rastîyê be ku hêj ew hînî cûdahîya nava zimanê cûda da nebûne. Ev zarrokê herwisa gengaze di dema ku pêwîst be hinek peyivan li zimanên dî "kirê" bigirît. Zarok giƉ Ɖarezayîyê xwe yê zimanî bi ev rewƉê bikar dîne.

Ev asa ye ku zarrok li maweya ku gel kesên dî yê du zimaî diaxive, zimanê xwe biguhere. Ev ji derfeta guhertinê di navbera zimanên cûda bo mebesta gotina xalên hûr û deqîq anku hestekê yan bo damezrandina hevbeƉîyekê di navbera kesên ku bi hemen zimanî diaxivin, bikar tînin. Lêkolîn nîƉa dide ku astek bilind ji Ɖarezayîya zimanî bo Ɖêyana guhertina baƉ di navbera zimanan da pêwîste û ev mijare di axavtinê du zimanî da asa û sirûƉtî ye.

Ji ber ku em di rewƉên cûda da zimanê cûda bikra dînin, ev normale ku zarrokên çend zimanî di herem û rewƉê cûsa da, zimanekê baƉtir tê bigehin. Bo mînak, zarrok gengeze bikare bûyerên dî baxçeya zarrokan da bi zimanê Norwecî baƉtir Ɖirove bike lê dema ku dixwaze liser rewƉa taybet bi mabatê û malê biaxive baƉtir dizane ku zimanê zikmakî bikar bîne. Zarok gengaze di axavtinê gel xiziman û dêbava zimanê zikmakî bikar bîne. Lêdema ku gel heval û xûƉik û birayê xwe diaxive, zimanên cûda bikar bîne.

5 EGER ZARROK DI MALÊ DA TENÊ BI ZIMANÊ NORWECÎ BERSIV BIDE, DIBE ÇI BÊ KIRIN?

Ev asa ye eger zarrokê du zimanî di maweyek taybet da hez diken ku bi Norwecî biaxivin, tevî ku dêbavê wan dixebitin û hez diken ku ev bi zimanê zikmakî biaxivin. Eger zarrok dema ku dêbav bi zimanê zikmakî diaxivin, Norwecî diaxive, dê bav dikarin bi bersiv dana pê peyiv û hevokên rast bi zimanê zikmakî alîkarîya zarrok biken. Lê, tiÐta giring pêwendî û têkilîya gel zarroke, cûda ji zimanê tê bikaranîn. Guhdarîya ji zarokê balkeÐtir ji diltirsîya ku zarrok kijan zimanî bikar dîne. Xala balkeÐ eve ku hûn bisebir bin. Di heremeka ku zimanê Norwecî pirr bi bandore û bi giÐtî rewÐek bilind heye ser zimanê zikmakî, tê hîn bûna zimanê zikmakî gelek dirêj bibe.

Bo gehîÐtin bi mebesta çend zimanî bûna zarrokan, giringe ku dêbav bi axavtina gel zarrok bi zimanê zikmakî berdewam bin. Eger zarrok yan mezinsalên dî ku bi zimanê zikmakî diaxivin li derdorê da bin, gelek baÐe bi rewÐek ku ziman li derveyê malbatê jî biakr bê. Heye eger zarrok bi rewÐek çalak bi zimanê zikmakî yê dêbava biaxive, bi pirranî gelek zêdetir ji tîÐtê ku dibêje, dikare tê bigehe. Eve dikare bibe esasek bo hînbûna bikaranîna çalaktir ji ziman di siberojê da saz bike.

6 BO ALÎKARÎ DAN JI PÊÐKETINA ZIMANÎYÊ ZARROK BITAYBET ZIMANÊ ZIKMAKÎ DIBE ÇI BÊ KIRIN?

Zarrokên ku zimanê wan Tirkîye di Tirkîyê da û zarrokên ku zimanê wan Norwecîye di Norwecê da, zimanê xwe yê zikmakî di gelek rewÐên cûda da û do pêwendîya gel xelkê cûda da hîn dibib, di malbatê da gel malbat û hevalan di baxçeyê zarrokan, di dibistanê, di firroÐgehê, di kolana û otobûsa. Di temamîya rojê da zarrok derfeta bihîstin, axavtin û hînbûna zimanê zikmakî heye. Gelek zarrokên ku paÐxana kêmnetewetîyê hene, derfetê kêm bo pêÐve birina zimanê xwe yê zikmakî di Norwecê da hene. Pirranîya zarrokan di asata yekim da zimanê zikmakîyê xwe di malê da dibihîzin û bikar dînin. Ev mijare berpirsîyek mezin dêxe ser milê dêbava ku dibe ligel baxçeyê zarrokan û dibistanê pêÐveçûna zimanê zikmakî bihêz biken. Mezin salê derdora zarokan dibe heya ku gengaze be, derfetan bo axavtina zarrokan bi zimanê zikmakî, hem di nav û hem li derweyê malbatê saz biken.

Gelek bajarvanî baxçeyê zarrokan yê vekirî pêÐkêÐ diken ku li nav da dêbav cem zarrokê xwe di baxçeyê zarroka da beÐdar dibe. Hûn dikarin bo hevdîtina dêbavê dî û zarrokan li dema lîstin, çalakî û têkilîyên civakî da serdana wan biken. Hinek bajarvanî, pirtûkxaneya gotina çîroka bi zimanên cûda pêÐkêÐ dike. Pirtûkxane herwisa pirtûkên zarrokan û ciwanan û pirtûkên dengî bi zimanên cûda bo kirêdanê, pêÐkêÐ diken. Liser derfetê bajarvanîya herem axwe lêkolîn biken. Herwisa, baxçeyê zarrokan û dibistan dikarin ji Pirtûkxaneya Çend zimanî mifa werbigirin û dibistan jî dikarin ji Pirtûkxaneya Deichman di Oslo vê da mifa werbigirin (www.dfb.deichman.no). Pirtûk li vir da bo zarrokan û mezinsalan bi gelek zimanên cûda berdestin. Pirtûkxaneya heremî dikare di kirê girtina pirtûkan livir da alîkarî bike. Di malpera www.morsmal.no da jî hûn dikarin pirtûk û pirtûkên dendî bi zimanên cûda, û herwisa helbestên baxçeyê zarrokan, ahengan û gelek çîrokan bi zimanên cûda peyda biken.

7 BO PIÐTGIRÎ LI PÊÐVEÇÛNA ZIMANÊ ZARROK BI TAYBET ZIMANÊ NORWEÇÎ DIBE ÇI BÊ KIRIN?

BeÐdarbûn di baxçeyê zarrokan xalek balkeÐe bo pêÐve birina zimanê Norwecîya zarrokên çend zimanî. Herwisa alîkarîya baÐ di navbera baxçeyê zarrokan, navenda saxlemîyê, dibistan û dêbava giringe. baxçeyê zarrokan û dibistanê erkek mezin bo pêÐve birina zarrokan bi zimanê Norwecî ser milê wan ne. lê rola dêbava ji hê bo pêÐve birina zarrokan bi zimanê Norwecî giringe. Dêbav ji tevî ku xwe nikarin bi baÐî bi zimanê Norwecî biaxivin, dikarin alîkarîya xebatên zimanî yê baxçeyê zarrokan û dibistanan biken.

Bo zarrokên pêÐ dibistanî, baxçeyê zarrokan dikarin derfetê baÐ û cûda bo pêÐveçûna zimanê zarrokan dabîn biken. Dema ku zarrok mezin dibe û diçe dibistanê, SFO (melhezeya paÐ dibistanê) yan xebatên dibistaên yên demên betlaneyê wek fotbal, koma koro, reqisîn, dibistana çandî û wek vê dikarin cîyên baÐ bo pêÐve birina zimanî û civakî bin. Dêbav dikarin zarrokan han biden ku beÐdarî ev xebatane bin.

Baxçeyê zarrokan berpirse liser asankirina pêÐketina zimanê zarrok di baxçeyê zarrokan, bi alîkarîya nêzîk gel dêbavê xwe. Baxçeyê zarrokan bi rêya bernameya çarçoveyek bo naverrok û erkên Baxçeyê zarrokan berpirse liser "PiÐtgirî ji zarroka bo bikaranîna zimanê xwe yê zikmakî li kêlega xebatên bi çalak bo geÐkirina Ðêyana axavtina bi zimanê Norwecî" (Wezareta perwerdehîyê 2011:35). Dêbav dikarin gel mamosteyê baxçeyê zarrokan liser pêdivîyên zarrokan bo handana ziman, bo mînak gelo derfeta bikaranîna berdestek du zimanî heye yan na, yan pêÐkêÐ kirina her core xebatên perwerdehîyên dî li baxçeyê zarrokan da biaxivin.

8 ÇIMA ZARROKEK LI BAXÇEYÊ ZARROKAN DA NA AXIVÎT?

Zarokek ku zimane nû hîn dibe bi rewÐn cûda gel zimanê nû pêwendîyê digirin. Hink zarrok bi lez dest pê diken ku peyiv û hevokan di zimanê nû da biakr bînin, lê hinek dî bo maweyek dirêj, hinek caran çend mehan, pêÐ bikar anîna zimanê nû sebir diken. Dema ku zarrok beÐdarî baxçeyê zarrokan dibe ku livir bi zimanê zikmakî na axivin, eve gengaze bibe sedema pêÐ hatina rewÐek aloz bo zarrok. Li maweya ev demê da, pêwendîya nêzîk û ewle gel mezinsalan li baxçeyê zarrokan da pir balkeÐe. Tevî ku zarrok gel zarrokan û mezinsala di baxçeyê zarrokan da bi zimanê Norwecî neaxivî, balkeÐe ku em binêrin ku zarrok bi rêyên dî pêwendîyê digire, bo mînak pê îÐareyan û pê bikaranîna çavlêkirin û zimanê îÐareyan. Zarrok hertim liser zimanê nû agahîyan û zanistan kom dike tevî ku bi zimanê Norwecî qet neaxive. Hinek zarrok gengaze pêÐveçûna zimanê wan paÐ bikeve yan tûÐî kêÐeyên zimanî bibin. PaÐê baxçeyê zarroakan û dêbav dibe liser çawanîya pêÐkêÐ kirina alîkarîya ji zarok re lihev biken, bo mînak, bi rêya wergirtina alîkarîyê bîyanî bi mebesta nirxandina pêÐveçûna zimanê zarrok û alîkarî danên zêde yê pêwîst bo zarrok hem di malê da û hem jî di baxçeyê zarroakan da.

Tevî ku çi zarrok yan mezinsalên dî ku bi zimanê zikmakî di baxçeyê zarroakan da biaxivin tune bin, naskirina zimanê zikmakî bi giÐtî bo pêÐveçûna çend zimanî bûna zarrok bi mifa ye. Dibe dêbav li dem ku di baxçeyê zarroakan da ne – her dem ku asa be – bi zimanê zikmakî gel zarrok biaxivin. Karmendên ku bi zimanê zikmakî yê zarrok na axivin, dibe bo mînak pê hîn bûna hinek peyivan, rîtman û ahengên zimanê zikmakî yê zarrok, meraqek erênî liser zimanê zikmakî yê zarrok nîÐan bid. BeÐdarbûna mezinsalan û zarrokê ku liser zimanê zikmakî Ðareza ne di baxçeyê zarrokan da bo pêÐveçûna çend zimanîya zarrok baÐe.

9 GELO DIBE ZARROK DI BAXÇEYÊ ZARROKAN DA DU ZIMANAN HÎN BIBÎT?

Gelek zarrokan zimanek zikmakî hene ku ev ne zimanê Norwecî ye û zimanê Norwecî wek zimanê duyem di baxçeyê zarrokan da hîn dibin. Ev giringe ku zarrok bête fehm kirin û derfetek bo gotina mebesta xwe hebe. baxçeyê zarrokan dibe ev rastîyê berçav bigire ku zarrok zimanê xwe yê zikmakî bikar dîne û hevdem bi rewÐek çalak bo bihêz kirina Ðarezayîyên zimanê Norwecî dixebite (Pilana çarçoveya 2011:35).

Bi Ðêweyên cûda dikarin piÐtgirîya zimanê zikmakî biken tevî ku karmend zimanê zikmakîyê zarok bizanin yan na, lê bo gelek zarrokan gengaze wergirtina alîkarîyê du zimanî di baxçeyê zarrokan da gelek balkeÐ be. Karmendên du zimanî dikarin liser bêtir kirina ewlehîyê hem bo zarrok û heêm bo malbata wî alîkarî biken û dikarin wekî pêwendîkerek bikevine navbera malê û baxçeyê zarrokan. Tevî kesek mezin sal ku zimanê zarok dizane, zarok dikare bê fehm kirin û mebesta xwe li pêwendîyê gel zarrokan û mezinsalên dî bide famandin. Zarrok hevdem gel wergirtina alîkarîya bo pêÐve birina Ðarezayîyê zimanê Norwecî, derfetek hêja bo geÐ kirina zêdetir ya zimanê zikmakî peyda dike.

AGiÐ baxçeyê zarrokan ku zarrokên bi paÐxana kêmnetewe hene dikarin bo wergirtina jêderên diravî yê dabîn kirî yê dewletî bi rêya Subsidies for alîkarîya xebatên geÐkirina têgehîÐtina ziman di zarrokên kêmnetewe di pêÐ dibistanê da, daxwaza xwe pêÐkêÐî bajarvanîyê biken. Ev dirave dikare li nav tiÐtên dî, bo bikaranîna berdestek du zimanî ku alîkarîya parastina pêÐveçûna du zimanîya zarrok dike bê bikar anîna. Agahîyên bêtir taybet bi ev mijarê li destûrnameya alîkarîyên dewletî di beÐa baxçeyê zarrokan da bixwînin: http://www.udir.no/Barnehage/Regelverk/Rundskriv/2011/Rundskriv-F-01-11-Statstilskudd-pa-barnehageomradet1/

10 DEMA KU ZARROK DIÇE DIBISTANÊ

Veguhestina ji baxçeyê zarrokan bo dibistanê dikare bûyerek mezin be bo gelek zarrokan – û dêbava. Ji bajarvanîya tê pêÐnîyar kirin ku Ðêweyên alîkarîya xwe bo ev veguhestinê berhev biken û dibe baxçeyê zarrokan ji bernameyek bo ev veguhestinê ji baxçeyê zarrokan bo dibistanê di benameya xwandina xwe da hebe. Dêbav dikarin agahîyên taybet bi ev mijarê li baxçeyê zarrokan yan berpirsê heremî werbigirin.

Dibe liser erkên dibistanê taybet bi zarrokê ku paÐxanek kêmneteweyî hene, bi taybet ji Zagona Perwerdehîyê §2.8 agahîya we hebe.

§2-8. Hîn kirina ziman taybet bo xwandekarên ku paÐxanek kêmneteweyîyê hene

Xwandkar di perwerdehîyê destûrî da ku xwedîyê zimanê zikmakî yê cûda ji zimanê Norwecî û Samî ne dibe ji perwerdehîya taybet bi zimanê Norwecî behremend bin heya femekê ku bi qasekî liser zimanê Norwecî Ðareza bibin ku bikarin perwerdehîyên asa di dibistanê da biÐopînin. Eger pêwîst be ev xwandekarane dibe ji perwerdehîya ziman bi zimanê xwe yê zikmakî, hînbûna mijarê bi du zimanan, yan herduyan behremend be. Perwerdehîya bi zimanê zikmakî dikare di dibistanek cûda ji dibistan ku xwandekar bi asayî livir beÐdar dibe, pêk bê. Dema ku perwerdehîya zimanê zikmakî û perwerdehîya du zimanî ya mijaran nikare ji alîyê berpirsê perwerdehîyê bê dabîn kirin, dibe bajarvanî heya radeya ku gengaz be, perwerdehîyê dî yê kêrhatî gel cîyê xwandekaran asantir bike.

Dibe bajarvanî pêÐ girtina biryarrê liser perwerdehîya zimanê taybet, Dêyana xwandekarn di zimanê Norwecî da binirxînît. Nirxandinek wisa ji dibe li maweya perwerdehîyê bo xwandekaran ku ligor pêwîstîya, kûrsên perwerdehîya zimanê taybet werdigirin, pêk bê, wek esasa ev nirxandinê ku gelo xwandekaran hêjayîya kêrhatî di zimanê Norwecî da hene bo Ðopandina perwerdehîya asa di dibistanê da yan na.

ÐIROVE KIRINA HINEK PEYIVAN

Zimanê duyem: Zimanek ku zarrok bi sirûÐtî ji derdora xwe xênjî zimanê zikmakî hîn dibe.

Zimanê pirranî: Zimanê ku pirranîya xelkê welatekê pê diaxivin. Di Norwecê da zimanê pirranî Norwecî ye.

Zimanê kêmanî: Zimanê axaftina beÐek ji xelkê welatekê ye. Di Norwecê da zimanên kevin Samîya baÐûrî, Lule-Samî û Zimanên Samîya Bakûrî, û zimanên kêmanîya netewî wek Kven hene. herwisa, hinek xelk bi zimanên kêmaneyên koçber wek Polonî, Somalî, Erebî, Tirkî, Vîetnamî, Tigrînyayî û hwd diaxivin.

Zimanê zikmakî: Gelek dibêjin zimanê zikmakî zimanê yekime ku hîn dibin, zimanê ku baÐtirîn têgehîÐtina we bi wî ye yan zimanê ku zêdetir hûn bê wê tênê nas kirin. Hinek jî dibêjin ku çend zimanê wan yê zikmakî hene û zimanê wan yê zikmakî gelek zimanin.

Çend zimanîtî: Wek peyivek komî bo du zimanîtî yan çend zimanîtî tê bikar anîn. Eve bi wê wateyê ye ku zarok di Ðona zanîna tenê zimanekê bi çend zimana diaxivît.

BELGEYÊN DEWLETÎ

- *Zagona baxçeyê zarrokan*

http://www.lovdata.no/all/nl-20050617-064.html

- *bernameya çarçoveyek bo naverrok û erkên Baxçeyê zarrokan*

http://www.udir.no/Barnehage/Rammeplan/

- *Zagona Perwerdehîyê*

http://www.lovdata.no/all/nl-19980717-061.html

BELAVOKÊN TAYBET BI ÇEND ZIMANÎTÎ YÊ

- *Gjervan, Marit (red.) 2006:*

Belavoka agahîyan mijarî liser cûdahîya zimanî û çandî di baxçeyê zarrokan da. Wezareta Perwerdehîyê û Lêkolînê

- *Høigård, Anne; Mjør, Ingeborg û Hoel, Trude 2009:*

Pirtûka agahîyan mijarî liser derdora zimanî û bandora zimanî di baxçeyê zarrokan da. Wezareta Perwerdehîyê û Lêkolînê

- *Mjelve, Astrid Øygarden 2002:*

"We tiÐtek wisa bihîstîye?" alîkarîyê du zimanî di baxçeyê zarrokan da. Wezareta Mijarên Zarrokan û Malbatî ya Norwecê

- *Navenda netewî ya perwerdehîya çend çandî (NAFO) 2010:*

Pirtûka jêdera – xebatên çend zimanîtîyê di baxçeyê zarrokan da

MALPERÊN PÊWENDÎDAR

Kesên ku pêwîstî bi rabêj û rênasîya liser perwerdehîyê çend zimanî di baxçeyê zarrokan da hene dikarin serdana malpera navenda netewîya perwerdehîya çend çandî (NAFO) biken www.hioa.no/nafo.

NAFO herwisa malpera taybet bi mijara zimanê zikmakî www.morsmal.no bi rêve dibe. Ev malpere xwedîyê jêderên perwerdehî, pirtûk, pirtûkên dengî, aheng û çîrokên bi zimanên cûda, bo baxçeyê zarrokan û dibistana ye.

Rêveberîya Perwerdehîya Norweçê hinek malper bo dibistanan û zarokistanan hene. Zagon, pilanên çarçoveyê, bernameyên xwandinê, belgeyên Ðîreta, û hwd livir hene www.udir.no.

Lijneya dêbava bo perwerdehîya destpêkî (FUG) û lijneya dêbava bo baxçeyê zarrokan (FUB) jêderê internetî bo dêbavê xwedîyê zarrokan di dibistan û baxçeyê zarroka ne. http://www.fug.no/http://www.fubhg.no/

Malpera Zimanên bêtir bo kesên nêtir di zanîngeha Tromsø da rabêj û agahîyan bo malbatê çend zimanî dabîn dike. http://site.uit.no/flerespraaktilflere/

Navenda netewîya perwerdehîya çend çandî (NAFO)
Kolej û Zanîngeha Zanistên Piraktîk ya Oslo û Akershus
NîÐanîya serdanê: Wergelandsveien 27
NîÐanîya postî: PB 4, St. Olavsplass, 0130 Oslo

Telefon: +47 22 45 22 82
Feks: +47 22 45 21 05
E-mail: nafo@hioa.no
www.hio.no/nafo